POLIZEI Nordrhein-Westfalen Landeskriminalamt

nêz ji welatî • şareza • serweriya qanûnê

# Agahiyên pêşîlêgirtinê ji bo mêvanên f estîvalên muzîkê

## Agahiyên pêşîlêgirtinê ji bo welatiyan

Berî ku hûn seredana festîvalê bikin, herî dereng li cihê li ba operatorê festîvalê an jî karmendên ewlwhiyê agahiyan li ser talîmat û amûrên ewlehiyê yên heyî bi dest bixin. Dûrketina ji xetereyê, di festîvalan de jî, qet nîşana tirsonekiyê nîne, lê belê aqlê selîm nîşan dide.

## Ez hîs bi tehdîd dikim an jî êrîş li min tê kirin. Ez dikarim çi bikim?

- Komek ava bikin. Hay ji hev hebin û piştgirî bidin hev.
- Li qeraxa girseyê bimeşin da ku bigihîjin armanca xwe.
- Bi qîrîna hevokên bilind yên wekî "Dest nede min", "Êrîş li min tê kirin!", an jî bi amûrên alarman û pîspîsokan bal bikşînin ser xwe û rewşa xwe.
- Bi awayekî çalak û rasterast ji kesên ne beşdar ên mîna mêvanên din ên festîvalê an karmendên ewlehiyê bixwazin ku alîkariyê bikin. Bi taybetî xîtabî van kesan bike, mînakî bi gotinên “Tu bi çakêtê şîn! Pêdiviya min bi alîkariyê heye!"
- Vekişin qadên ewle. Ev dikarin, wek nimûne, xalên pêwendiya alîkariya yekem yên servîsa bijîjkî an jî standên firotanê bin.
- Bi jimareya acîl 110 polîs agahdar bikin.

## Ez di mirovên din de tevgerek birîndarker, ji sînor derbazbûyî an tehdîdkar dibînim. Ez dikarim çi bikim?

- Dudil nebin û bi awayekî çalak û rasterast mêvanen din ên festîvalê an jî karmendên ewlehiyê ji bo alîkarîkirinê bang bikin.
- Xwe nexin tehlûkeyê de.
- Bi jimareya acîl 110 polîs agahdar bikin.

## Ez hîs bi tehdîd dikim an jî êrîş li min tê kirin. Gelo çekên berevaniyê, wekî spreyên berevaniyê, dikarin bibin alîkar?

Polîs rexne li bikaranîna çekên bi navê berevaniyê dike, wek spreyên berevaniyê. Her nezelaliyek di tevgerê de, her bi derengketinek di karanîna çeka berevaniyê de dikare encamên kujer ji we re pêk bîne. Dibe ku sûcdar jî bikaribe "çeka berevaniyê" ji destê we bigire û paşê li dijî we bikar bîne. Bikaranîna spreyên berevaniyê yên li dijî mirovan, heger ew birîndar bibin, dikare di lêpirsîneke sûcê de pêvajoya lêpirsînê li pey xwe bîne. Ji kerema xwe bala xwe bidin ku hemî çekên ku di bin qanûna çekan de ne û di bin hin şert û mercan de destûra "hilgirtin"a wan di nav gel de heye, li gorî § 42 ya Zagona Çekan hilgirtina wan di bûyerên giştî de qedexe ye. Ev yek sûc e. Hûn dikarin bêtir agahdarî ji navenda polîsê xweya herêmî bistînin.

**Têkilî:**
**Landeskriminalamt Nordrhein-Westfalen**
**Völklinger Straße 49**
**40221 Düsseldorf**

**Rewş: Tebaxa 2022´an**

(https://polizei.nrw/wachenfinder).

## Gelo ez dikarim ji bo serdanek festîvalê ya ewle wekî din çi dîqet bikim?

- Nas, xizm û dostên hev divê piştgiriya hev bikin û li hev xwedî derkevin.
- Vexwarinan li ba garsonê siparîş bikin û bi xwe wan bigirin.
- Vexwarinên vekirî bêyî çavdêrî nehêlin.
- Heger kesên xerîb vexwarinên vekirî an xwarinê pêşkêşî we dikin, bi awayekî rexneyî kontrol bikin.
- Dermanên bi guman yên qaşo bê zirar (mînak ji bo serêşê) ji xerîban qebûl nekin.
- Berî her tiştî hişyarî û alîkarî tenê hingê hewce ye dema ku kesên xerîb li endamek koma we / xizmekî we ê ku hewcedarê alîkariyê ye, dinêrin û dixwazin kesê mexdûr ji wir derxînin.

## Kî dikare di rewşa awarte de alîkariya min bike?

- Bal bikışînin ser xwe û rewşa xwe. Bi awayekî çalak û rasterast ji mêvanên festîvalê ên din, karmendên ewlehiyê an servîsa bijîşkî bixwazin ku alîkariyê bikin.
- Di rewşa hebûa bûyerek sûcê de, bi jimareya acîl 110 polîs agahdar bikin.
- Heger hûn gewrîdaniyê hîs bikin - derhal bi rêya karmendan, servîsa ewlehiyê, servîsa bijîjkî an jî bi jimareya acîl 112 alîkariya bijîşkî bistînin.

## Nesîhet jo bo heval û rêhevalan:

- Kesên mexdûr bi tenê nehêlin. Di rewşek acîl de, mêvanek din ê festîvalê dikare were wezîfedarkirin ji anîna servîsa bijîjkî. Gelek madeyan bi gelemperî dikarin bi ceribandinên bilez / pêşîn yên bazirganî yên ji bo mîzê werin tespîtkirin. Mînakî, hûn dikarin testan li dermanxaneyan bi dest bixin.
- Di rewşa hebûna gumanê de derhal bi jimareya acîl 110 polîs agahdar bikin.